Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

# Biryardana li ser dawayên penaberiyên yên welatiyên Sûriyê hatiye rawestandin

Rewşa ewlehiyê li Sûriyê guheriye. Ji ber vê yekê me biryardana li ser dawayên penaberiyê yên welatiyên Sûriyê duşema 9/12/2024 rawestandiye. Hem dawayên penaberiyê û hem jî dawayên domandina îqameya penaberiyê û îqameya parastina duyem hatine rawestandin. Gava ku rewşa ewlehiya welatekî diguhere, rêkareke giştî ye ku biryardana li ser dawayên penaberiyê bi demkî tên rawestandin.

Bo biryardana penaberiyê herdem nûtirîn agahiyên derbarê welatî hewce ne ku xizmeta welatnasiyê ya Daîreya Koçberan ji çavkaniyên cuda dicivîne û bi çalakî nû dike. Ji ber guherîna desthilatê li Sûriyê niha agahiyên me yên derbarê rewşa wî welatî kevn bûne. Dema ku agahiyên derbarê rewşa wî welatî hatin nûkirin, em dikarin dîsa biryaran li ser dawayên penaberiyê û dawayên domandina îqameyên welatiyên Sûriyê bidin.

Ji ber ku rewşa ewlehiya Sûriyê guheriye, niha dijwar e were pêşbînîkirin ka em dikarin dîsa biryar li ser dawayên penaberiyê û dawayên domandina îqameyên welatiyên Sûriyê bidin. Em ê di zûtirîn demê de dîsa daxuyanî bidin gava ku biryardan dîsa mimkin be. Li ser rûpela me ya rewşa Sûriyê çavdêriya daxuyaniyên me bikin.

## Gelo tu welatiyekî Sûriyê yî û dawa penaberiyê yan domandina îqameyê dikî?

Tevî ku biryardan niha hatiye rawestandin, dikarî hê jî dawa penaberiyê ji karbidestên sinor yan ji polîs bikî.

Eger dawa domandina îqameyê li ser bingehê penaberiyê yan parastina duyem bikî, dawa xwe pêşkêş bike berî ku îqameya te ya niha bi dawî bibe. Eger di dema diyarkirî de dawa domandina îqameyê bikî, mafê te yê karkirinê qut nabe.

Hevpeyivînên penaxwaziyê ku bo welatiyên Sûriyê hatine girtin, tên dirêjkirin lê dem bo hevpeyivînên nû niha nayên girtin.

## Vegerîna dilxwazane

Niha alîkariya vegerîna dilxwazane bo Sûriyê ne mimkin e. Em guherînên mihtemel li ser rûpela xwe ya rewşa Sûriyê radigihînin.



10.12.2024 – kurmandzi

Asiakastiedote: Päätösten teko syyrialaisten turvapaikkahakemuksiin on keskeytetty